Giringiyên Zanistî yên Anfalan

Dr. Ebdulbaqî Mayî

Roja 24-î sibata 2007-ê dadgeha navneteweyî ya Lahay, li welatê Holenda, kuştina xelkê Bosniya bi destên leşkerê dewleta Yogoslaviya kevin, di destpêkên 1990-î de, bi qirkirinê hukim kir. Lê çinku çi belge û dukoment yên nivîsî li ser fermanên rijêma Yogoslavî, ji bo vê qirkirinê bi dest dadgehê nekeftibûn, êdî dadgeh neşiya rijêma Yogoslavî gunehbar bike, lê ew Genoside wek guneha efser û karbidestên şerker yên Sirbî hisab kirin.

Her wê rojê, kenalên satelaytên biyanî û xweyanî, bi rasterast dadgeha 5 xizmetkarên rijêma Seddam Husenî li ser kiryarên Enfalan belav kirin. Kurdekê xelkê gundê "Ocmet Al-Akrad" wek şahid ji bo ku di dadgehê de, berevaniyê ji gunehkarekê bike, hatibû gazîkirin. Kurdê me bi cil û bergên xwe yên kurdî û bi ezmanekê erebî yê rewan, medh û sena vî gunehkarî dikir. Kurdê me yê şahid, nimûne li ser nimûneyê li ser zîrekî, wefadarî û çakiyên vî gunehkarî dianîn. Ev gunehkare di wextê Enfalan de, sekreterê Komîteya Karûbarên Bakûr bû, ya ku serperiştî û bi rêvebirina Enfalan dikir.

Van her du dadgehên di heman rojê de, di medya cîhanî de belav bûyîn, pirsyarek di serê min de çêkir: Gelo bo çi kuştina xelkê Bosnî bi destên Sirbiyên Yogoslavî li dadgehek navneteweyî hate hukimkirin û wek Genoside hate hisabkirin, belê karesateka wek Enfalan ya mezin û ji alê neteweyî ve stratejîk, di dadgeheka Îraqî de, hate xendiqandin û kete di koşa hindek mirovên bêhewl û şiyan de, heta ku li dûmahîkê kurd bi xwe, berevaniyê ji gunehkaran bikin, wek kurdê me yê xelkê "Ocmet Al-Akrad"?. Heger Enfal ketiba bersînga dadgeha navneteweyî ya Lahay tu bibêjî gumanek da bo dadgehê çêbe li ser guneha rijêma Seddamî ku fermanên Enfalan rakirin?

Gelek nivîs û dukoment li ser karyayên Enfalan li serhildana 1991-ê bi dest me kurdan ketibûn. Gelo ew hemû belge û dukoment çi lê hatin? Bo çi ew niho dijî rijêma Seddamî di dadgeheka navneteweyî de, nahêne bikarînan? Heger ew hemû dukomentên nivîsî li ser biryarên fermî yên rijêma Seddamî têra gunehbarkirina vê rijêmê di dadgehek navneteweyî de nekin, bila lêkolînên zanistî yên li ser Enfalan bikevin kar. Bisporên kurd û yên biyanî ji, babetên zanistî li ser Enfalan belav kirine. Çawan ew lêkolîn li dadgeha dijî bazirganê Holendî yê ku çekê kîmyayî firotî Seddam Husênî hatin bikarînan, hêşta çêtir ew dişên ji bo dadgeha dijî Seddamî jî, bihêne bi karînan.

Her wesa xelkê kurd yên ku ji Enfalan rizgar bûyîn bi hezaran di Kurdistanê de hene û li derveyî welatî jî, wek dendikên hinarê li cîhanê yên vepeqijîn û belav bûyîn. Paxilên wan ji serhatî û bîrhatinên naxweş yên Enfalan pir in. Herçî gava berpirsên me kurdan xwe li wan rizgarbûyên Enfalan bikin xwedan û bispor û şehreza yên babetên derûnî, komelnasî û yasayî lê haydin, ew dê belgehên zanistî û akadîmî yên bêguman ji bo dadgeha dijî rijêma Seddamî peyda bikin. Vî xelkî, ne tenê dastanên lê qewimînên Enfalan wek evro li bîrên wan in, belkî ew dikarin bibin mamosta û şehrezayên bihagiran, ji bo dersgotin û peydakirina nimûneyên giring ji bo wan lêkolîn û zanistan.

Biyaniyan berî xweyaniyan dest bi lêkolînan li ser Enfalan kirin û karyarên Enfalan bi Genoside li qelem dan. Dukomentên pêşî li ser guneh û zordariyên Enfalan bi destên biyaniyan hatin nivîsîn û belav bûn. Eve di demekî de diqewimî, wextê ku bisporên me kurdan xwe dikuşt û disot ku derfetekê bibînin da xwe li dîrok û mafên xelkê xwe bikin xwedan. Neko pisporên kurd di van babetan de, nebûn yan jî sist û xav bûn, belê wan kes li pişt xwe nedît ku harîkarî û piştgîriya wan bikin. Gelo heger bisporên kurd derfetên xwe dîtiban tu bibêji da niho meseleka hinda mezin ya wek Enfalan hema wesa bi sanahî bikeve ber dadgeheka nizim ya neteweyî, li şûna biçe bersînga dadgeha Lahay?

Niho jî hêşta derfeta karkirinek zanistî û akadîmî li ber me kurdan maye. Meteleka Swêdî dibêje "Direng ji çine çêtir e". Şûna paşguhxistin û pûtepênekirinê piştgîrî û harîkarî ji serokatiya Kurdistanê bo bispor û zanayên kurd pêtivî ye, ji ber ku bi duristî xizmeta xwe bo xelkê xwe pêşkeş bikin. Çi guman tê de nîne, heger dadgehên navneteweyî seha belgehên zanistî li ser Enfalan bikin, ew dê bi sanahî qirkirina Enfalan wek Genoside dijî rijêma Seddamî biçespînin.

Ez bawer dikim ku xwe rukumandin li ser daxwaza rastiyê û ji bo bikarînana Enfalan, bi rengek zanistî û akadîmî bo avakirina binyatên stratejî yên neteweyî, bisporên kurdan zehf in û amade ne. Ew dê li ser daxwazên rizgarbûyên Enfalan her piştgîr bin û binyatên destgehên zanistî û akadîmî li ser Enfalan ji bo paşerojê danin. Rojek dê bihêt gunehbarên Enfalan, dê li dadgehên navneteweyî bihên mehkûmkirin û Enfal wek Ginoside dê bihête nivîsîn, da mafên xelkê me winda nebin.